
**BUYDED**
Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi
ISSN: 2147-5679

# Şerha Mesnewiya Camê Wehdet

**Kerem ENGİN***

* Doktora, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî, kengin_cevizdibi@hotmail.com




**Nirxandina Pirtûkê**
**Pêvajo:** Hatin: 10.04.2026, Qebûlkirin: 27.04.2026, Weşandin: 28.06.2026
**Telîf:** Ev xebat di bin lîsansa Creative Commons Attribution-NonCommercial-NoDerivatives 4.0 International License (CC BY-NC-ND) de hatiye parastin.
**Daxuyaniya Etîkê:** Di pêvajoya amadekirina vê xebatê de prensîbên zanistî û etîk hatine şopandin û xebatên sûdjêgirtî hemû di çavkaniyê de hatine nîşandan.
**Destûra Lijneya Etîkê:** Ji bo vê lêkolînê destûra lijneya etîkê ne hewce ye.
**Piştgirî û Berberiya Menfîetan:** Nivîskar diyar dike ku ji bo vê vekolînê fona derveyî nehatiye bikaranîn û bi dezgeh, rêxistin û kesan re berberiyeke menfîeta madî tune û di navbera nivîskaran de jî berberiya menfîetê tune.

**Book Review**
**Process:** Received: 10.04.2026, Accepted: 27.04.2026, Published: 28.06.2026
**Copyright:** This work is licensed under a Creative Commons Attribution-NonCommercial-NoDerivatives 4.0 International License (CC BY-NC-ND).
**Ethical Declaration:** Scientific and ethical principles were followed during the preparation of this work, and all cited studies are indicated in the bibliography.
**Ethics Committee Permission:** Ethics committee permission is not required for this study.
**Grant Support and Conflict of Interest:** The author declares that no external funding was used for this research, that there is no financial conflict of interest with any institution, organization, or individual, and that there is no conflict of interest among the authors.

**Cite:** Engin, K. (2026). Şerha mesnewiya Camê Wehdet. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, *12*(23), 77-81.

OPEN ACCESS

Pirtûka Camê Wehdet berhemeke şerhê ye ku li ser şi‘reke farisî bi pexşankî hatiye nivîsîn. Berhem bi pêşgotina amadekarî dest pê dike. Li dawiyê jî destnivîsa vê berhemê wekî pêvekê hatiye danîn. Di beşa ewil de derheqê zatê Xwedê de agahî hatine dayîn. Piştre behsa sebebê telîfa pirtûka Camê Wehdet tê kirin. Her wisa behsa heft sifetên Xwedê wekî; saxiyatî, zanîn, bihîstin, dîtin, şiyan, axaftin û vînê tê kirin. Ev pirtûk di sala 2016ê de li Hewlêrê ji aliyê Çapxaneya Zankoya Silêmaniyê bi zimanê kurdî, bi tîpên erebî hatiye weşandin. Bes li ser pirtûkê ISBN nehatiye nivîsîn. Ev berhem li gel pêvekê 129 rûpel e. Bi gotina amadekarî, xwediyê şerhê û dîroka nivîsîna vê pirtûkê diyar nînin. Bes li gorî amadekarî, ji ber rengê destxet, nivîsîn û kaxezê ev berhem kevin xuya dike. Amadekar aşkere dike ku herçend ev pirtûk ji aliyê qewarê ve biçûk be jî, ji aliyê bihayê xwe ve biqîmet e. Ev pirtûk wekî pexşaneke edebiyata kurdî ya klasîk tê nîşandan.

Behsa sê kesên bi navê Ewhedîn tê kirin ku dibe nivîskarê vê berhemê bin. Amadekar di derbarê zeman û şêweya vê şerhê de têbîniyên xwe wisa diyar dike: “Em nizanin kanî xwediyê vê şerhê kî ye, bes ji lehçe û terzê nivîsînê aşkere dibe ku xwediyê vê şerhê ji devera Badînan e. Diyar dibe ku ev destnivîs ji destnivîsên Amêdiyê ne û devoka nivîskarê şerhê jî ji devera Badînan e”. Ji bo devoka devera Badînan jî çend peyvan wekî nimûne nîşan dide. Ji aliyê amadekarî ve ji bo zelakirina metnê jî hinek jêrenot hatine dayîn.

Li gorî agahiyên amadekar dide, ev berhem ji pexşanên dîdaktîk e, bi zaraveya kurmancî/Hekariyan hatiye nivîsîn. Mijara vê berhemê eqîda Îslamê ye. Mijar li ser mezheba eş‘arî hatiye lêkvekirin û rengê irşada sofiyan jî di nav xwe de dihewîne. Amadekar dibêje: xwediyê vê berhemê ji tixûbên wergêranê derbas bûye û li ser metnê şerh, te‘liq û delîl jî nîşan dane. Disa amaje pê tê kirin di dîroka edebiyata kurdî de nayê zanîn ku şa‘irekî kurd pexşanek wisa li ser şi‘reke farisî nivîsîbe, lewma meriv dikare bibêje ku cara yekem kitabek bi vî terzî tê belavkirin.

Camê Wehdet di çarçoveya edebiyata kurdî ya klasîk û hizra tesewufê de, xwedî îdiaya dagirtina valahiyeke giring e û paşxanek dewlemend pêşkêş dike. Camê Wehdet hem metnekî edebî û hem jî kelamî-tesewufî ye. Lewma meriv dikare bibêje ku ev berhem hem ji aliyê şiklî ve hem jî ji aliyê naveroka xwe ve berhemeke giring e. Ji aliyekî din ve ji bo edebiyata kurdî ya klasik, ji aliyê wergerê ve giringiya vê berhemê derdikeve pêş. Lewma wergera vê şi‘ra farisî ya bi pexşankî dibe destpêkek ji bo kurmancî. Herçend di berhemê de nehatibe diyarkirin çima navê berhemê Camê Wehdet e jî, lê wisa dixuyê ku naveroka berhemê li derdora Wehdeta Xwedê û eqîda Îslamê dizivire, vêca navê wê danîne Camê Wehdet. Berhem bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsîn û 298 beyt e. Camê Wehdet bi sifetên Xwedê û şirovekirina her sifetekê di çarçoveya tesewufê de, aliyê dîdaktîk ê metnê bi zelalî derdixe pêş. Herwiha, tekeziyên cihê reseniya berhemê ya di nav edebiyata kurdî de, xebatê ji bo wêjeyê (literatûrê) watedar dike. Li gel vê yekê berhem bi têkiliya dîsîplînên tesewuf û kelamê re nîşan dide ku ew bi nêzîkatiyeke navdîsîplînî (interdisciplinary) hatiye nivîsîn.

Ev berhem ji aliyê Tehsîn Îbrahîm Doskî ve hatiye amade kirin. Îlahiyatnas û wêjezan Doskî şexsiyetekî zana û nivîskarekî welût e. Wî li ser gelek mijarên cûr bi cûr berhem nivîsîne. Tefsîra Qurana Pîroz, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, Şerha Dîwana Feqiyê Teyran, Şerha Mewlîda Bateyî û şerha Mem û Zînê ji çend xebatên wî yên

giring in. Hinek berhemên wî li Bakur jî ji aliyê Weşanxaneya Nûbiharê ve hatine latînîzekirin û weşandin. Camê Wehdet jî ji aliyê Doskî ve ji bo weşanê hatiye amadekirin. Wek li jorê jî amaje pê hate kirin ku nivîskar û nasixên pirtûka Camê Wehdet diyar nînin. Lewma me wekî amadekarê vê pirtûkê behsa Doskî kir. Doskî li bajarê Duhokê niştecih e û xebatên wî yên ilmî berdewam in.

Beşa ewil a berhemê balê dikşîne ser hindê ku bes zatê Xwedê hêjayî perestinê ye û kesek nikare derheqê zatê wî de bibe xwedî agahî. Bes dilên hişyar dê sirra Xwedê bizanin û bibînin. Lewma perdeya zat û fi‘lên Xwedê di sifetên wî de hatine zimên. Dema perde rabû û Xwedê di hebûnê de hate dîtin, sirra Xwedê di her cihekî de dê bête temaşekirin û zanîn.

Ji bo rêvingê eşqê serboriyek wekî mîsalekê tê teswîrkirin. Li gorî nivîskarî rêvingiya vê serboriyê ji malê dest pê dike. Ev rêving bi şev û rojan teleba rehma Xwedê dike û umrê xwe di rêka wî de dê serf dike. Ev rêving li rojava û rojhelat bi qehr û xezeba wî tê bezandin û teqandin. Lewma rêving bi hemî rengan bizavê dike. Rêvingê rêka wîsalê caran wekî bilbil û evdalekî qelender, caran jî wekî aşiqan gerana xwe didomîne. Her wisa di nav civak û miletên cûr bi cûr çûnûhata wî dewam dike. Li erd û esmanan, behr û beran wekî bayê birûskê û serxweş li çar aliyên dinyayê umrê xwe bi vê geranê derbas dike. Vêca divê ev rêving qet bêhêvî nemîne û her dem bizavê bike. Mebesta vê rêvingiyê ev e ku Xwedê bê nasîn. Ji bo nasîna Xwedê di vê berhemê de heft sifetên wî tên nîşandan. Herwekî hate gotin zatê Xwedê nayêt zanîn û dîtin, bes teceliyên rehma wî di sifetên wî de xwe nişan didin. Lewma hewcehî pê heye ku ev sifet bêne zanîn da Xwedê bête nasîn.

Nivîskar ewil behsê sifetê saxîtiyê dike. Dema ev sifet hate zanîn can dê ji eşqa Xwedê sax bibe. Wek agahî tê danê, sirrê xeybê li ber însanî ya veşartî ye, dema însanî xwe bi ava heyatê paqij kir, ew dê ji mirinê xilas bibe û dê ji sirr û xeybê agahdar bibe. Mirin jî wekî bêçaviya giyanî tê teswîrkirin. Divê bê zanîn ku însan xwediyê çi hebûnê nîne û her tiştekî xwe ji sifetên Xwedê wergirtiye. Bi sedan okyanûs li cem giyanê însanî wekî pişkekê tê zanîn, bes zanîna meydana me‘rîfetê însan e.

Herwiha di derbarê sifetê zanînê de agahî tê dayîn. Zanîn li dinya û axretê wekî burhanekê tê nîşandan. Tişt jî bi saya zanînê ve jêk tên cudakirin. İlim di giyanê însanî de wekî tezahura navê Xwedê yê ismê ezem/mezin tê nîşandan. Diyar dibe ku ilim dibe sebeba azadiya însanî, her wisa parçeyeke nezanînê dê însanî bixe nav belayê jî. Lewma erka ilmî/zanîne dibe wesîla bexteweriya însanî. Tê zanîn ku bingeha ilmê însanî ji ilmê Xwedê ye. Lewma pêwîst e ku însan vî ilmî bi dest xwe bixin. Nivîskar careke din nezanînê wekî dojehê teswîr dike. Ew kesê ji ber nezanînê bireve dê bibe ehlê Xwedê. Vêca amaje pê tê kirin ilim her ew e ku dilê însanî sax bike. Nivîskar li ser giringiya guhî/bihîztînê diraweste. Bi saya bihîstinê ve însan dê bibe xwedî agahî û dê dergehê xebera rastiyê ji bo wî vebibe. Li vir giringiya sifetê Xwedê yê semî’ tê nîşandan. Dema Xwedê ji sifetê xwe tecellî kir, însan dê bibe xwedî gotin û dê sirrên xeybê bizane. Piştre însan dê Xwedê binase û tiştên berze dê li pêş çavên wî aşkere bibin û dê cemala wî bibîne. Îcar bi wî awayî guhê paqij dê dengê Xwedê bibihîze.

Ji bo sifetê besîr jî tê gotin ku dema çavê însanî vebû dê gencîneya Xwedê li ber çavên wî aşkere bibe. Bi sifetê besîr ronahî dê bikeve çavên însanî. Wê demê li her cihekî ku însan mezê bike dê teceliyên Xwedê bibîne. Vêca ew dê ji sirişta însanî derbikeve û dê bigihe alema îlahî. Lewma Xwedê çav dane însanî da Xwedê û şunwarên wî bibîne. Di vê helbestê de tê nîşandan ku însanî şiyana xwe ji vî sifetê Xwedê wergirtiye. Diyar dibe dema şiyana ilmî li cem însanî peyda bû, ew şiyan dê însanî zana bike. Vêca însan dê karen xwe hemî bi vê şiyanê bi cih bîne. Me'rîfet û nasîna Xwedê dê bi vê şiyanê bête zanîn. Qudred/şiyan ji bo dinya û axretê dê bibe wasita bilindiyê. Her wisa amaje bi şiyanên cûr bi cûr yên bêmize/bêheq tê kirin.

Nivîskar dibêje: Piştî axaftin li cem însanî peyda bû sirrên Xwedê li ser zimanê wî bi karegirî dê bêne gotin û xelq jî ji bo axaftina wî dê telepkar bibe. Bi vî awayî axaftin li ser zimanê wî dê carî bibe û am û xas dê guhdariya wî bikin. Vêca axaftin dê ji "ilmê yeqîn" bête beyankirin û dê bi awayekî "Eynel yeqîn" derbikeve. Bi kelama Xwedê, benî dê ji sirrên veşartî biaxive û dê ji kêmasî û eyban bête paqijkirin. Her wisa nivîskar dibêje: hindî însan kelama Xwedê ku ew jî Qur'an e, bixwîne dê sirra ilmê Xwedê bi dest bixe û dê ji sirra afirîneran jî bibe xwedî agahî.

Pirtûk bi agahiyên sifetê îradeyê dawî dibe. Ev beş ji hemî beşên pirtûkê dirêjtir e. Her wisa naveroka vê beşê wekî kurteyeke beşên borî jî diyar dibe. Bi agahiyên derbarê sifetê îradeyê ve helbest dawî dibe. Nivîskar dibêje: Bi îradeya Xwedê afirîner peyda bûne û hatine nîşandan. Her wisa bi îradeya Xwedê hijdeh hezar alem, heft asîman, milyaket û hwd. hatine afirandin. Bi vî awayî giyanê însanî ji vê îradeyê hatiye wucûdê û aqil jî bi vê îradeyê ve ketiye giyanê însanî. Vêca heke însan bi îradeya Xwedê hereket bike, ev îrade dê bibe îksîra kimyaya wî. Wê demê însan dê ji qusîran xilas bibe û dê bigihe pileyên bilind. Li vir mînaka sifr û zêrî tê dayîn, dê bi vê îksîra kîmyayê sifir dê bibe zêr. Lewma bi îksîra kîmyayê zêr û sifir ji hev cuda dibin.

## Encam û Nirxandin

Di vê pirtûkê de behsa heft sifetên Xwedê hatiye kirin. Ev sifet saxiyatî, zanîn, bihîstin, dîtin, şiyan, axaftin û vîn in. Dema Xwedê însan afirandî ji van sifetên xwe dane însanî. Bes Xwedê ezelî û ebedî ye, ev sifet li cem însanî fanî ne. Çawa Xwedê ev sifet dane însanî, her wisa dema wext hat dê careke din ji însanî bistîne. Vêca menbe‘ê jiyana însanî Xwedayê muteal e. Însan bi tena serê xwe xwedî çi hebûnê nîne, hebûna xwe ji Xwedê wergirtiye. Dema însanî bi sifetên xwedê rengê xwe wergirt ev sifet wekî tecelliyên Xwedê li cem însanî dê zahir bibin. Lewma di encamê de dema însanî saloxetên xwe ji saloxetên Xwedê wergirtin tecelliyên Xwedê di wî de dê diyar bibin. Wê demê dê bi çavê rastiyê gerdûnê mêze bike. Hingê gerdûn ji bo însanî dê bibe neynika tecelliyên Xwedê.

Di destpêka vê pirtûkê de amadekar amaje bi hizrên helbestvanî yên wekî “Wehdetî Şuhûdê” dike. Di beşa pêncem de hizrên helbestvanî yên wekî “Wehdetî Wucûd”ê jî xuya dibin. Di vê helbestê de termên tesewufê yên giran hatine bikaranîn. Ev jî ji bo famkirina hizrên helbestvanî dibe sebeba zehmetiyê. Ji bo ku xwîner fam bike di qismê pexşanê de hawcehî bi şerheke rohntir hebû. Weku tê zanîn ev berhemeke dîdaktîk e. Ji ber vê yekê dikare ji bo perwerdeya feqiyên medreseyan bibe çavkanî. Lewre bi şêwazeke menzûm hatiye nivîsîn, ev teybetî jî ji aliyê perwerdeyê ve fonksiyona vê berhemê çalaktir dike.

## Çavkanî

Doskî, T. Î. (2016). *Şerha Mesnewiya Camê Wehdet*. Çapxana Zankoy Seleheddîn.